



Peymana Mafên Lênihêrîna Kesên Temen Mezin

Mafê min heye ku ez:

1. lênihêrîn û xizmetên ewle û bi kalîte;
2. bi rûmet û bi hurmet tevbigerin;
3. nasname, çand û cihêrengiya min bi nirx û depîştgirî be;
4. bê tade lêkirin û bê feramoş bijîn;
5. bi awayekî ku ez fam dikim derbarê lênihêrîn û xizmetên xwe de agahdar bim;
6. xwe bigihînim hemû agahiyên di derbarê xwe de, tevî agahiyên di derbarê maf, lênihêrîn û xizmetên min de;
7. bila kontrola min li ser lênihêrîna min de, û jiyana kesane û civakî de hebe, tev bijatîne ku rîska kesane tê de hene;
8. bila kontrola min li ser û karibim biryarên xwe der heqê aliyên şexsî yê jiyana min a rojane, karên darayî û xwedîtiyê de bidim;
9. serxwebûna min;
10. bêm guhdarîkirin û fêhmkirin;
11. Kesekî ez bixwazim hebe, tevî parêzvanekî lênihêrîna kesên temen mezin, piştgiriya min bike an jî li ser navê min biaxive;
12. gilîyên bê kîn, û gilîyên min bi awayekî adilane û di cih de bêm kirin;
13. taybetmendiya kesane û zanyariyên min yê kesane bê parastin;
14. mafên xwe bi kar bînim bêyî ku bandoreka neyînî li ser awayê tedawîkirina min bike.

Xerîdar

Îmzeya xerîdar (an jî kesê xwedî destûr) (eger hilbijartîbin ku îmze bikin)

Nav û paşnavê xerîdar

Nav û paşnavê kesên xwedî destûr (eger hebe)

Pêşkêşker

Îmza û navê temam yê karmendê pêşkêşker

Navê pêşkêşker

/ /

Dîroka ku xerîdar kopyek ji Peymanê bi dest xist

/ /

Dîroka ku xerîdar (an jî kesê xwedî destûr) derfet hatiye dayîn ku Peymanê îmze bike

Peymana Mafên Lênihêrîna Kesên Temen Mezin

Xerîdar

Xerîdar xwedîyê vebijêreka îmzekirina Peymana Mafên Lênihêrîna Kesên Temen Mezin (Charter) in. Xerîdar eger îmze nekin jî dikarin lênihêrîn û xizmetan bistînin.

Heger xerîdar biryarê bide ku Peymanê îmze bike, ew qebûl dike ku pêşkêşkerê wan ji wan re kopiyek ji Peymanê daye wan û ji wan re bûye alîkar ku fêhm bikin:

- agahîyên di derbarê mafên xerîdar yên di derbarê xizmeta lênihêrîna kesên temen mezin de; û
- agahîyên di derbarê mafên xerîdar de yên di bin Peymanê de ne.

Pêşkêşker

Li gorî qanûna lênihêrîna kesên temen mezin, divê pêşkêşker alîkariya xerîdaran bikin ku mafên xwe fam bikin û derfeteke maqûl bidin her xerîdarekî, ji bo îmzekirina Peymanê. Divê pêşkêşker kopiyeka ji Peymanê ya ku destnîşan dike bidin xerîdaran, yê ku di nave de:

- Îmzeya karmendê pêşkêşker;
- Dîroka ku pêşkêşker kopiyek ji Peymanê daye xerîdar; û
- Dîroka ku pêşkêşker derfet dide xerîdar (an jî kesê xwedî destûr) ji bo îmzekirina Peymanê;
- Îmzeya xerîdar (an jî kesê xwedî destûr) (heger ew îmze bikin); û
- Nav û paşnavê xerîdar (û kesê xwedî destûr, eger pêk were).

Ji bo qeydên xwe divê pêşkêşker kopiyeka Peymanê ya îmzekirî bigire.